

Ûemîa he ji Newrozê dîkin!

Heker ez hizira Newrozê dikim, hizira min dîkit zalim u agir ji teyrêrê sutin, seyran, reqisîn, kiras u fistanêrê nî, u ala (‘elema) Kurdî.



“Newroz” ye’nî “nî roj” e yan roja ‘ewilî ji serê sala Kurdî ye, u eve destpêka roja ‘ewilî ya biharê ye. Roja ‘ewilî ya riznama Kurdî ji zimanê berê ye.

Erê hiravîê Newrozê çi ye? Helbet tu dizanî. Belkî tu kiravîek dî guh lê bî.

Li roja 21 bi heyva sê li sala 612, Kawe asinger zalimek kuşt. Navê wî Zeñak bî. U ji ber hindê Kawe azadî bu Kurda u hindê miruvêrê Rojhelata Navîn îna. Eve he çîroka Newroz e ku hevalekê min (navê wî Heval e) gut min jiberî hindê sal.

**Newroza we
pîruz bit!**



Hiravîê Newrozê

ji laê Hevalî

Dibêjin zemanê berê hêkimek zalim hebî. Navê wî Zeñak bî. Zeñak dû ser hebîn. Serek mar bî.

Rojekê ew nesax bî. U dibêjin hêkîm u nujdar hatin da bizanin ewî çi ye. U gutinê, “Dermanê te tu her roj xwîna dû genca vexwî.” U piştî wextekê gelek genc hatin kuştinê.

Rojekê asingerê hebî. Navê wî Kawe bî. Ewî hêkîmî divîa kurrê wî bikujit u xwîna wî vexwit. Kawe jî ne divîa eve. Jiber hindê hêmi xelk u alem kum kirin u gute wan, “Ez dê Zeñakî kujim.”

Xelkê bawer ne kir çunku Zeñak bi hêz bî. Bes ewî gut, “Ne, ez dê ev şeve wî kujim. U heker min kuşt, ez dê agirekê hilkim u hîn dê zanin.”

Kawe wê şevê çû da Zeñakî bikujit. Çû def u gutê, “Eve kurrê min da tu xwîna wî vexwî.” Wextê Kawe çû nêzikî wî, şîrek serî da serê wî jê vekir. U çend nubedarêrê wî jî kuştin.

Çû ser banê kelha wî. U kumlekek zer li ber bî. Êxist u bilind kir bî ala Kurdistanê. Dîv da agirek hilkir u bilind kir da xelkê wan devera bizanin ku eve bî azadî u rêzgar bîn ji wî hêkîmê zalim. U xelkê hêmi bi keyf bîn u derketin ji malêrê xu. Ewan jî agir hilkirin serê gira u çîaîya u nihala u rêka ser banêrê xu. Keyfa azadîa wê rojê ya Newrozê bî.

U wesa hêmi xelkê u alemî zanin. (U wekî Kawe agir hilkir bajêrê dî zanî. Ewî bajêrê agir hilkirin. Wesa bajêrek dî zanî.)

U jiber hindê Kurd hîeta nuke her Newroz agirî hilkin wekî nîşanekê bu azadîê ji destêrê zalima.